

**Saziya Fêrkrin û Parastina
Zimanê Kurdî Li Sûriyê
Konfiransa Salane ya bajarê
Helebê li dar xist**

Li 30.5.2624 K – 2012 Z , S . F . P . Z . Ks bi beşdariya mamosteyên zimanê kurdî yê sazîyê li bajarê Heleb û hin mîvanên hêja mîna mamoste Ronî Elî û Reşît Ebas konfransa xwe ya salane li dar xist .Konfirans bi pêşewaziya beşdarên û kêlîkek bê deng li ser giyana hemî kesên jiyana xwe ji bo ziman û çanda kurdî ji dest dane û pakrewanên azadiyê û rûmetê dest pê bû . Di dû re , rapora rêvebirîya sazîyê ya bajarê Helebê hate xwendin , paşê jî ji aliyê mamostên beşdar ve , rapor hate şirove û rexnekrin . Di nav re jî , gelek pirs ji rêvebirîyê hatin kirin , û bersivên wan pirsan ji aliyê rêvebirîyê ve hatin dandin . Di encam de , gelek biryar û pêşniyar hatin kirin , ew jî ev in :

- 1- Gereke sazî di fêrkirî de , bêtir berê bide zarok , ciwan û jinan .
- 2- Pêwîste pirtûka destpêka rêzîmên were guhertin an yeke nû were amedekirin .
- 3- Çêtire weşanek li ser zimên bi navê sazîyê derkeve .
- 4- Eger cîgehek Enternêta yan rûpelek fêsbûkê bi navê sazîyê hebe baş e .
- 5- Berferhkirina sazîyê û pirkirina mamostên wê li bajarê Helebê hewcedariyek e .
- 6- Pêşniyar ew e , ku pileyên fêrkirina abe û destpêka rêzîmên bi bin yek û fêrname piştî destpêka rêzîmên were dandin .
- 7- Roja 15 Gulanê– yê ku wek cejna zimanê kurdî hatiye binavkirin – bibe roja çalakîyên ji bo zimanê kurdî .
- 8- Pêwîste endamên rêvebirîyê li korsên fêrkrinê hin caran bibin mîvan .
- 9- Di herdu heyvên Tebax û Tîrmehê de , divê sazî – çi qas ci were – korsên fêrkirî li bajarê Helebê pir bike . Li dawiyê , biryar hate standin , ku sazî rêznamekê bide herdu mîvanên beşdar , ji ber xebata wan ya berbiçav di ber zimanê kurdî de . Her wiha komîtak rêvebirîyê ji sazîyê re , li Helebê hate hîlbijartin , û bi xatirxastinê ji beşdarên , konfirans hate bi dawîkirin .

**S . F . P . Z . Ks
Ya bajarê Heleb**

Dumahîk : Sambola..

ser bingeha berjewendî û bêbexitiya van dewletan mafên Kurdan wînda û bin cil dikirin . Lê gelê Kurd, li pêş vê bêbexitiyê serî neditewand û bê hêvî nediman, lewre jî , di sala -1925- de şoreşa xwe di herêma Diyar-Bekir (Amed) , Orfê û Mardînê de bi serkêşîya pakirewanê gelê Kurd Şêx Se,îd pîranî lidarxistin .Lê Atatîrik bi hovîti ew şoreş perçiqand û bi top , tiving û bafirokan bajiar û gundên Kurdan kaviil û wêran kirin . Bi wê tenê nedikir, pêlanên xwe digêrandin û berê xwe dida dewleta Firansa ta ku rîya hesin ya Helebê li pêş wan bête vekirin .Pêwîste were zimên ku hîngê Firansa dewleta Sûriyê dagîr kiribûn . Loman jî daxweza Atatîrik li rex dewleta Firansa cî digirt û rîya hesin li pêş wan dihate vekirin , hîngê Tirkan -100,000-hezar leşker bi ser gelê Kurd de dişand, tevger û şoreş dihate rûxandin û -45- kes ji serok û rêberên Kurdan dihatine girtin û -28-ê Hizêrana sala -1925-an de Şêx Se,îd û dikitor Fo,ed di gel hevriyên xwe ve heyif û mixabin ew bi bêbexiti têne darvekirin . Lewre jî wan di nêv refên pakirewan û nemirên gelê Kurd de cî digirtin û îro ew bi şahinazî ji neviyên xwe re bûne sambûla pêdarî û rizgariyê.

